



## Agahdarî li ser vîrusa koronayê

### Vîrusa Koronayê çi ye?

Vîrusa koronayê, –wekî Sars-CoV-2 jî tê zanîn– vîrusek e ku yekem car, di Kanûna sala 2019an da li sûka bajarê Wuhan ya Çînê derketiye holê. Ew, wek mînak, bi dilopên ku di dema axavtin, kuxînan jî pişkdana mirovekî derdikevin, dighîje miroveke din. Sars-CoV-2, êdî li çar alîyê cîhanê tê dîtin. Nexweşîya ku ew bû sedem, COVID-19 hatîye bi navkirin. Ew dikare, bi şêveyên cuda û dereceyên dijwar da xuya bike. Bi pêvajoya nexweşîyê ve girêdayî, COVID-19 dikare bibe sedema serma girtina normal, lê di heman demê da sedema metirsîya kêmgirtina pişikê jî. Hevoka Koronayê, bi xwe Latînî ye û tê wateya kulîlk an jî tac. Ew vedigere wek vîrusê xuyadike, ku dişibe kulîlkê.

### Mirov çawa bi vîrusa koronayê pêdikeve?

Vîrus, ji mirovekî derbasî mirovekî din dibe. Wek mînak, dema axavtinê, kuxînan an jî ger mirov destê xwe bide yekî dinê.

### Mirov çawa dizane ku vîrus pê ra heye an na?

Ger vîrusa koronayê li cem kesekî hebe, wek mînak, li cem wî kesî, kuxik, xûra gewrîyê, herikandina bêfilê, serêş an jî êşa laş û agirê laş ji ser 38° C zêdetir peyda dibe. Nîşan pir dişibin ên grîpê. Li cem gellek kesan, ji bo demeke kurt, bîhn û tam girtin qels dibe; an jî bi tevahî ji holê radibe. Hin kes virîkî dibin; zikêşê dikevin û dilê wan lihev dikeve. Pirsgirêkên nefesê, bronşît, an kêmgirtina pişikê jî dikarin bibin nîşanên enfeksiyona koronayê.

Nîşanên yekem, bi piranî pênc-şeş roj piştî enfeksiyonê dîyar dibin. Lê belê, ew dikare 14 rojan jî bajo, ku heta nîşanên nexweşîyê pêşve biçê.

Ger nîşan li cem we hebin, ji bijîşkê xwe yê malê ra têlefona bikin. Wê hingê bijîşkê we dikare biryar bide, ku gelo pêwîst e li cem we testa koronayê çêbikin. Ger hûn nekarin bi bijîşkê xwe ra peywendî çêbikin, dikarin li ser hejmara têlefona 116 117, serî li tendûristîya tibbî ya amade bidin. Ger nîşanên enfeksiyona koronayê li cem we hebin, divê hûn li malê bimînin û têkilî bi kesên din ra danenin.

### Çima vîrusa koronayê xeter e?

Li gel piranîya mirovan, nexweşîya vîrusa koronayê, bi asanî derbas dibe. Lê belê, li gor Enstîtuya Robert Koch, li dora 20 ji sedî kes, nexweşîyê giran derbas dikan. Ger nexweşî giran derbas bibe, piştî heft-deh rojan, nîşan hertim xerabtir dibin û mirov bi zehmetî nefesê digrin an pişika wan kêmgirtir digire. Heya nuha, mirovên ku ji vîrusê jîyana xwe ji dest dane, bi piranî kesên kal û pîr in û her weha, ji mêj ve nexweş bûn.



## Ger nîşanên nexweşîyê li cem min hebin, divê ez çî bikim?

Ger agirê laşê we, kuxikê we hebe, an jî nefesgirtin zehmet be, divê hûn têlêfonê ji bijîşkê xwe ra vekin û randevûyekê saz bikin. Bijîşkê we dikare biryar bide, ka pêwîst e ku testek koronayê li cem we çêbikin. Demên ku bijîşkê we li ser kar nebin, dikarin seranserê welêt, li ser hejmara têlêfona 116 117, serî li tendûristîya tîbbî ya amade bidin. Têkilî bi kesên din ra nekin û bi kêmanî 1,5 heya 2 metroyan ji kesên din, dûr bisekin.

Li malê an di odeya xwe da bimînin. Di enîşka xwe da bikuxin û bipişkin an jî di nav destmalekê da, ku hûn paşê wê bavêjin nav gemarê. Destên xwe bi pir çaran û bi rêkûpêk bişon.

Ger COVID-19 li cem we peyda bûye, ji bo tevgerandina xwe, hûn dikarin ji [Enstîtuya Robert Koch](#) alîkarî werbigrin.

## Divê ez çî bikim, ger peywendîyên min bi kesek vîrus wergirtî ra hebe?

Ger peywendîyên we bi kesekî ra hebe, ku li cem wî vîrusa koronayê hebe, herin mala xwe û bêyî ku nîşan derkevin holê, bi lez têlêfonê [beşa tendûristîya](#) (Gesundheitsamt) xwe ya herêmî bikin. Piştî hevpeyivînê, ew dikarin ji bo rewşa we ya şexsî, tedbîran pêşniyar bikin û li ser gavên din ên pêwîst biryar bidin. Dibe ku têlêfon meşqûl be, ji ber ku di heman demê da gelek kes têlêfon dîkin. Bi kerema xwe, di vê rewşê da jî li ser vê hêjmarê 030 346 465 100, têlêfonê [Wezaretê Tendûristîyê a Federal](#) bikin. Tenê bi zimanê Almanî şewirmendî heye.

Ger hûn di cihê vehewandina penaberîyê, an jî di kampeke hevbeş da dijîn, bi lez rêveberîya cihê vehewandinê an jî karmendan agahdar bikin. Her weha, wek mînak; dibistana xwe, dibistana zimên, cihê fêrbûna pîşeyî, an cihê karê xwe jî agahdar bikin.